




VALG

AGAHI

Kurdiya Kurmanjî | Kurmanji

Hilbijartina 2019-ê ya şaredariyê û meclisa navçeyê

Agahiyên girîng bo hilbijêran



Roja hilbijartinê duşemê 9-ê Îlonê ye. Nasnameya xwe ji bîra neke!

VALG direktoratet

Hilbijartina 2019ê ya şaredariyê û meclisa navçeyê

Hilbijartin derfetê dide me ku em kesên me di meclîsên şaredariyan û navçeyan de temsîl bikin, hilbijêrin.

Meclîsa şaredariyê desteya bilind a şaredariyê ye. Biryarên li ser meseleyên herêmî wek pêşdibistan, silametiya zarokan, pirsigirêkên plankirin û erdê, dibistanên pêşîn û navîn, xizmetên tenduristiyê û dermankirinê, înnîsiyatîfên çandî û komkirina çopê li vir tînin girtin.

Meclîsa navçeyê desteya bilind a rêveberiya navçeyê ye. Meclîsa navçeyê biryarên li ser meseleyên wek perwerdehiya lîseyê, rêyên navçeyê û rotayên girêdayî keştiyan, hatinçûna gelemperî ya herêmî û înnîsiyatîfên çandî digire. Oslo dê hilbijartina meclîsa şaredariyan û yê meclîsên herêmî pêk bîne, lê ev ê hilbijartina meclîsa navçeyê nebe.

Meseleyên herêmî tesîra herî mezin li ser jiyana we ya rojane dikin. Bi dengdayîna hûn biryar didin ka kî dê we û daxwazên we temsîl bike di meclîsa şaredarî û meclîsa navçeyê de.

Ev biroşûr agahiya awayê dengdayîna dihewîne.

Roja hilbijartinê duşemê 9ê Îlona 2019an e.

Gelek şaredarî di heman demê de hilbijartinan 8ê Îlonê pêk tînin. Şaredarî dê bide xuyakirin ka hilbijartin dê rojekê dewam bike yan du rojan.

Dema hûn dengê xwe didin nasnameya xwe bi xwe re bînin

Pasaport, lîsansa ajotinê yan jî karta bankayê ya bi fotografa we mînakên nasnameyan e yê tînin qebûlkirin. Herwiha hûn dikarin cureyên din ên nasnameyan jî bi kar bînin. Herî kêr, di nasnameya we de divê navê we, dîroka rojbûna we û fotografa we hebe. Nûnertiya Norwecî ya People Act ji hilbijêrên ku memûrên hilbijartinê nas nake dixwaze xwe bide naskirin.

Eger hûn di saziyekê de wek aramxane, nexweşxane yan jî hewsê hûn dikarin memûreke/memûrekî vê saziyê bînin da ku nasnameya we tesdîq bike. Di van şertan de, memûr divê xwe bidin naskirin.

Karta hilbijartinê dê ji hemû hilbijêran re bê şandin

Rûpela pêşîn a karta hilbijartinê dê agahiyên derbarê navenda hilbijartinê ya ku hûn lê qeydkirî ne û saetên vekirî yê roja hilbijartinê bihewîne. **Hûn ne mecbur in karta hilbijartinê bi xwe re bînin lê eger hûn bînin hûn ê zûtir karê xwe bikin.** Karta hilbijartinê wek nasnameya nayê qebûlkirin.

Kî dikare deng bide?

- Welatîyên Norwecî yên ku di dawiya sala 2019ê de dê bibin 18 salî û yên ku wek niştecih li Norwecê qeyd bûne.
- Welatîyên welatekî din ên Skandinavî (wek Danmark, Ayslend, Fînlenda yan jî Swêd) yên ku di dawiya sala 2019ê de dê bibin 18 salî û yên ku heta 30ê Hezîrana 2019ê qeyda xwe di Daîreya Sicîlê ya Netewî de wek niştecih qeyd bûne.
- Kesên ku ne welatîyên Norwecî ne, di dawiya sala 2019ê de dê bibin 18 salî û yên ku yên ku di sê salên pêşiya hilbijartinê de qeyda xwe di Daîreya Sicîlê ya Netewî de wek niştecih qeyd bûne.

Memûrên xizmetên diplomatîk û konsulxaneyê û malbatên wan, bêyî ku lê binêrin ka di Daîreya Sicîlê ya Netewî de wek niştecih qeyd bûne yan na, xwediyê heqê dengdayînê ne. Hewce nake serî lê bidin ji bo ku bikevin qeyda hilbijêran.

Hilbijêr, ji bo ku heqê xwe yê dengdayînê bi kar bîne, divê li şaredariyekê bikeve qeyda hilbijêran.

Li ku û kengî hûn ê bikaribin dengê xwe bidin?

Di roja hilbijartinê, hûn divê li şaredariya ku hûn lê qeydkirî ne dengê xwe bidin wek niştecih di 30ê Hezîrana 2019ê. Hûn dikarin yek ji cihên sindoqên yên li şaredariyan. Ravekirinên li ser rûpela piştî vê yên ku hûn ê çawa li şaredariya xwe dengê xwe bidin nîşan dide, binêrin şaredarî.

Dengdayînê zû ji Şemîya 10ê Tebaxê dest pê dike heta Îniya 6ê Îlonê li her şaredariyeke li welêt.

Hilbijêrên ku nikarin dengê xwe di dema hilbijartina zû yan jî roja hilbijartinê de bidin dikarin bi şaredariyê re bikevin têkiliyê û dengê xwe ji dema 1ê Tirmehê heta ku dema dengdayîna zû ya ku 10ê Tebaxê dest pê dike, bidin.

Eger hûn dengê xwe ji derveyî şaredariya xwe didin, kaxiza dengê(an) ya ku hûnê bistînin dê navên partiyên siyasî yên bi awayekî netewî qeydkirî bihewîne. Hûn ê xaçekê daynin qituya vê partiya ku hûn dixwazin dengê xwe bidinê. Kaxiza dengê(an) dê navên namzetên partiyên nehewîne û ji ber vê hûn ê nikaribin dengê xwe bidin şexsan.

Eger partî yan jî koma ku hûn dixwazin dengê xwe bidin di kaxiza dengê de nehatibe nivîsandin hûn dikarin navê partiyê/komê li ser kaxiza dengê binivîsin. Her wiha hûn dikarin kaxizeke dengê ji şaredariya xwe bistînin û vê kaxizê bi kar bînin eger bixwazin dengê xwe bidin şexsan.

Eger hûn derveyî şaredariya xwe dengê xwe didin divê hûn memûrê/memûra hilbijartinê bixwazin ku mohrê li kaxiza dengê bide beriya ku hûn vê bixin nav zerfa kaxiza dengê. Paşê jî memûrê/memûra hilbijartinê dê zerfa kaxiza dengê û karta sindoqê bixe nav zerfê girtî. Paşê divê hûn vê zerfa girtî biavêjin qitûya dengê.

Eger we karta hilbijartinê bi xwe re neanîbe memûrê/memûra hilbijartinê dê kartekê ji we re tije bike. Deng dê ji bo hejmartinê ji şaredariya we re bê şandin.

Heman tişt çêdibe **eger we di hilbijartina navçeyê de li derveyî navçeya xwe dengê xwe dabe.**

Eger hûn nexweş bin an jî astengdar bin hûn dikarin serî li şaredariyê bidin ji bo ku hûn ji mala xwe dengê xwe bidin beriya xewtê hilbijartinê. Şaredarî dê we di derbarê dîroka dawî de agahdar bike.


Eger hûn di Daîreya Sicîlê ya Netewî de li şaredariyekê yan jî navçeyê ya ku tesîra reforma şaredarî yan jî herêmî li ser heye, wek niştecih qeydkirî bin hûn ê temsîlkarên meclîsa şaredariyê ya şaredariya nû û meclîsa navçeyê ya navçeya nû hilbijêrin.

Şaredarî dê cihê navendên hilbijartinê û saetên wan ên xebatê ji we re bibêje.




Herwiha hûn ê bikaribin navenda hilbijartina xwe ji Tebaxê şûnde bibînin li:
valglokaler.no


Hûn ê çawa li şaredariya xwe dengê xwe bidin?




1) Kaxiza(ên) dengê ya ku hûn dixwazin bi kar binin bigirin: yek ji bo hilbijartina meclîsa şaredariyê û yek ji bo hilbijartina meclîsa navçeyê eger hûn dixwazin di van her du hilbijartinan de dengê xwe bidin.




2) Ji bo dengê şexsî bidin xaçekê daynin li rex listeya namzetên li ser kaxiza dengê yên ku hûn dixwazin dengê şexsî bidinê. Hûn dikarin dengê xwe bidin hemû namzetên ku hûn dixwazin deng bidinê (li rêberiya li ser rûpela din binêrin).



3) Kaxiza(ên) dengê qat bikin da ku navên partiyên bikeve hûndir û cihê mohrê bikeve derve - ev yek rê li ber kesan digire ku awayê dengdana we nebîne. Kaxiza(ên) dengê nekin nav zerfêkê yan jî kapaxeke din.



4) Herin ba memûreke/memûrekî hilbijartinê da ku kaxiza(ên) we yên dangan mohr bike. Ev yek, ji bo ku deng were qebûl kirin girîng e.




5) Kaxiza(ên) dengê biavêjin nav qituya dengê.

Oslo dê hilbijartina meclîsa şaredariyan û yên meclîsên herêmî pêk bîne, lê ev ê hilbijartina meclîsa navçeyê nebe. Eger hûn di deftera hilbijartina Osloyê qeydkirî bin û dixwazin di hilbijartina meclîsa navçeyê de dengê xwe bidin hûn dikarin kaxiza dengê ji bo hilbijartina meclîsa navçeyê bi kar binin an jî navê partî/koma ku hûn dengê xwe didinê li ser kaxizeke vala binivîsin. Eger hûn kaxizeke vala bi kar tînin dibê hûn li ser kaxizê binivîsin ku ev ji bo hilbijartina meclîsa navçeyê ye.


Hûn dikarin guherînan li kaxiza dengê pêk bînin

Eger hûn bixwazin tesîrê li ser hîlbijartina namzetan bikin hûn dikarin dengê şexsî bidin namzetên ku hûn dixwazin dengeke şexsî bigirin. Bi dilê we ye ka hûn dixwazin bi dendayîna şexsî guherînan li kaxiza dengê bikin yan na. Prose-dura dengdayîna şexsî li ser kaxiza dengê hatiye terîfkirin.

Dengdayîna dengê şexsî:




1) Xaçekê deynin di qutiya li rex navê kesê ku hûn dixwazin dengê şexsî bidinê. Hûn dikarin dengê şexsî bidin hemû kesên ku hûn dixwazin.



2) Navê namzetên ji partiyên/komên din li cihekî cuda di kaxiza dengê de binivîsin. Hejmara navên namzetan hûn dikarin lê zêde bikin li ser kaxiza dangan hatiye nivîsandin.

Ji kerema xwe haydar bin ku eger hûn dengê şexsî bidin namzeteke/namzetekî ji partî/komeke din, dengê listeyê dê ji bo partî/koma din bê hesabandin. Ev dibe ku li belavbûna mazbatayan di meclîsa şaredariyê de tesîr bike.




Di hîlbijartinên meclîsa navçeyê de: Xaçekê deynin di qutiya li rex navê kesê ku hûn dixwazin dengê şexsî bidinê. Hûn dikarin dengê şexsî bidin hemû kesên ku hûn dixwazin.

Kî dê bê hilbijartin?

Komîteya hilbijartinê ewil dê diyar bike ka dê çend nûnerên her partî yan jî komê hebe di meclîsa şaredariyê û meclîsa navçeyê de.

Komîteya hilbijartinê paşê dê dengên şexsî hilbijêre da ku bizanibe ka kîjan namzet ji kîjan partiyê û komê hate hilbijartin.

Hûn dikarin zêdetir agahî peyda bikin li ser valg.no



Di sala 2019ê de ji aliyê Rêveberiya Norwecî ya Hilbijartinan hatiye çapkirin.
Ev broşur her wiha di Bokmål, Nynorsk, Sami û deh zimanên din de jî heye.

Ji bo zêdetir agahiyên derbarê hilbijartinê binêrin valg.no